**Danxuyandina Çapemenîyê – 809/09/2020**

# Bakurê Ren Vestfalyayê çarçoveya Qaydeyên Parastina ji Koronavayrusê firehtir dike: ji bo bazarên Noelê û şahîyên taybet, fermanên qanûnî yên nû hatin anîn

30.09.2020
Rûpela 1 ji 3yan

Staatskanzlei
Pressestelle
40190 Dusseldorf
Têlefon 0211 837-1134 veya 1405
Telefaks 0211 837-1144

presse@stk.nrw.de
www.nrw.de

**Wezîrîya Karkirinê, Sihetê û Karên Civatî vê danxuyandinê belav kir:**

Kabîneya Eyaletê tevlî 31ê çîrîya pêşîn a 2020î heta vê tarîxê qaydeyên koronavayrûsê dirêj kiriye. Digel çalakîyên din, ji bo bazarên Noelê û şahîyên taybet dê hin guherîn û pêvekirin di rewacê de bin. Ji bo Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê dê pêvekek bê bihevxistin û ew ê fermana qanûnî ya li ser bazarên Noelê bên xuyandin û bê xistin rewacê. Gava şahîyên taybet ên li derveyê cîhên şexsî yên ji bo rewşên taybet (wekî dawetan) bên lidarxistin, eger bêtirî 50 mêvanan tevlî wan bibin, divê pêşîn di dezgeha birêkûpêkîya gelî ya herêmî de qeyd bê vekirin.

Wezîrê Sihetê Karl-Josef Laumann vê daye zanîn: “Astên enfeksîyonê yên van demen paşîn nîşan didin ku di belavbûnê de bandoreke ciddî ya şahîyên taybet heye. Em naxwazin werin radeyeke ku em mecbûr bimînin nehêlin alî bên kêleka hev. Herweha divê em baş bizanin ku mvêan di van şahîyan de qaydeyan pêk bînin. Ji bo nehiştina belavbûna bêtir û şikandina zincîrên enfeksîyonê hêmana herî giring zanyarîyên têkilîkirinê ne.

Herweha veşarîbûna jîyana taybet ji bo şahîyên mala mirovî di rewacê de ye. Lê ez hîvî dikim ku her kes hê jî bi çavekî ciddî li koronavayrûsê binihêre; bi pêkanîna qaydeyên paqijîyê û navberê xwe û kesên din ewle bihêlin! Kes çi çend hay ji tevgerên xwe hebin dê wek civateke yekperçe bandora wê ew çend mezin be. Dê bi taybetî mehên payîzê û zivistanê di têkoşîna şofa koronavayrûsê de dewreke dijwar be.”

## Fermanên Qanûnî yên ji Bazarên Noelê re Hatî

Ji bo ku gava şofa koronavayrûsê Bazarên Noelê bi awayekî biserketî bên birêxistin, pîlanê paqijîyê û xwegihandinê yê parastina ji

enfeksîyonê yê ku li ser rewşên herêmî cuda cuda raweste divê. Bi şertê ku ew ji rêyên birêveçûnê û kuçeyan bi awayê fizîkî cuda bin, ji Bazarên Noelê re, li cîhên xuyandî wek maseyên sabit destûr tê dayîn. Ev fermana qanûnên ji bilî van ji bo xizmetên xurekîyê jî ji niha û pê de di rewacê de ye.

Karxane, gava dewra demsala Noelê û hema piştî wê dê karibin rojên yekşemê bên vekirin. Ev ê jî alî bike ku xirecira rojên şemîyê yên mexazeyan pêkhatî kêm bibe û nehêle komên Mirovan ên xirecir li cîhê navendî kom bibe.

**Fermanên qanûnî yên li ser şahîyên taybet**

Ji bo şahîyên taybet ên li derveyê cîhên taybet pêkhatî û (wek dawetan) di hin rewşên taybet de birêxistî û hîvîya bêtirî 50 mêvanan ji wan re kirî, bi kêmayî berî sê rojên karî divê di dayreya birêkûpêkîya gelî de ji bo wan qeyd bê vekirin. Ji bilî van divê navê ji çalakîyê berpirsîyar e bê dayîn û lîsteyeke mêvanan bê amadekirin û di seransera çalakîyê de bê nûkirin. Gelek giring e ku dayreyên birêkûpêkîya gelî destûrê bi hev bixe û bi tenê bi qeydê re têkildar bibe. Bi saya vî awayî meqamên dezgehên bajarvanîyê li ser şahîyên cîhên di serwerîya wan de ne dibin xwedîzanîn û eger bivê çavdêrîyê bikin ka gelo Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê tên pêkanîn yan na. Şahîyên bi vî awayî herî pir bi 150 mêvanan sînorkirî dimînin. Qaydeyê ewlehîyê ji bo şahîyên di serê meha çîrîya pêşîn de jî di rewacê de ye. Lê yên ku çalakîyê li dar dixin, divên heta mumkin be bi lez, eger na, bi derengî be jî xwe qeyd bikin.

Ji bilî van, lihevkirinên palpişt bi biryara federal û eyalete ya di tarîxa 29ê îlona 2020î de, dê li sînorên tevlîbûyîyên di Qaydeyan de xuyandî bên zêdekirin. Yanî eger di nava 7 rojan de 35 bûyer pêk bên, dê şahîyên li cîhên gelî nikaribin bi bêtirî 50 kesî pêk bên. Eger 50 bûyer hebin ev sînor dadikeve 25 tevlîbûyîyan. Bi şertê ku pîlanên paqijîya taybet û parastina ji enfeksîyonê pêk bên, dibe li gora bûyerê ji bo hin îstîsnayan destûr bê dayîn.

Ji bilî van birêvebirîyên federal û yên eyalete, her wek li xwaringehan çawan e, dane zanîn ku eger zanyarîyên têkilîkirinê yên li lîsteyan ên dikin çavdêrî bê kirin ên şexsî sexte bin, dê ceza bê pêkanîn. Mêvanên li Bakurê Ren-Vestfalyayê ev cûrê danzanîna bi virran didin dê bi 250 Euroyî bên cirmkirin. Eger ji bo şahîyên li wan hîvîya bi kêmayî 50 kesan

e li derveyê cîhên taybet pêk tên qeyd neye kirin dê cirmkirineke 500 Euroyî bê pêkanîn.

Di pîlanên paqijîyê û parastina ji enfeksîyonê de, di çarçoveya medeyê înovasyonê de dê bêtir guh bê dayîn bikarhatina sîstemên hewadayînê yên nû. Eger bê rast der bikeve ku nûbûnên teknîk tedbîrên din ên parêzkar bêvîyan dikin û û bi belge bê îsbatkirin; dibe di Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê yên Wezîrîya Karî, Sihetê û Karên Civatî de de îstîsnayên cûrbicûr bên pêkanîn.

***Yek dikare ji vê navnîşanê xwe bigihîne bultena çapemenîyê:***
***www.land.nrw***

***Danzanîna tevahî ya parastina daneyan***